Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 39**

# 5 - Nasnameya siyasî ya projeya Selaheddînê Eyûbî

Di vê mijarê da, bîr û bawerî li ser *Selaheddîn* pir têvel û cuda ne. Li hêlekê, yên îslamî pesna wî didin wek têkoşerekî Misilman ku li hember *Firengan* (Xaçeperestan) derket, welatên Misilmanan û Qudus jî di nav da, ji wan rizgar kir. Li hêleka din, neteweperestên sunneyî yên erebbûyî li ser wî, wek qehremanekî erebî diaxifin. Li hêla din, Elewî, Îsmaîlî û Şî'eyên erebbûyî ji wî bi kîn û nefretin, bi angaşta ku wî *Xîlafeta Fatîmî* ji holê rakiriye.

Kurd jî, derbarê Selaheddîn, xwedî bîr û baweriyên cuda ne. Alîyek ji Kurdan, wî wek qehremanekî hêjayî rêzgirtin û hurmetê dibîne, ji ber ku ji Kurdan ra raboriyeka rûmetdar afirand. Aliyekî din, wî wek têkoşerekî payebilind dibîne ku Misilman ji talanên Xaçeperestan parastin. Aliyê sêhem ji Kurdan, wî wek kurdekî ji nasnameya xwe ya neteweyî bidûrketî dihejmêre; dibêjin wî dikarîbû dewleteka kurdî bi navî Îslametiyî avabike, wek çawa Ereb, Faris û Turkan jî wisa kir. Lê belê ev tişt nekir; û Kurd ji bo yên din kirin xizmetkar.

Gelo rastî çi ye?

## Nasnameya projeya Selaheddîn:

Ji bo naskirina nasnameya projeya *Selaheddîn*, divêt em vê mijarê di çarçewa rastî û rewşa sedsala 6-ê goçî (12-ê z.) da gengeşe û şîrove bikin û em hêmanên taybet yên malbata *Eyûbî*, hêmanên herêmî yên girêdayî *Xîlafeta Ebbasî*, *Xîlafeta Fatîmî*, *Dewleta Zengî* û çanda fedakariyê ku di wê demê da serdar bû, li ber çavan bigirin. Ji ber ku têkilî û lêguncîna van hemû hêmanan kir ku *Dewleta Eyûbî* bi rêveberiya *Selaheddîn* peyda bibe.

### Yekem - Hêmanên malbatî:

Malbata *Eyûbî* vedigere ser hoza *Rowadî (Rewadî)* ya êla kurdî ya gewre *Hezbanî (Hedheban, Hezewan, Hezewend*[1], *yan jî Hedban)* ku berê jî malbateka padîşahî di sedsala yekem b.z. heya sedsala sêhem z. da pêkanîbû; ew padîşahî bi

[1] Mehrdad R. Izady, the Kurds, rûpel 28.

navê *Padîşahiya Adiyabêne* dihate naskirin û paytextê wê bajarê Hewlêrê (Erbîl) bû. Wek tê xuyakirin, ev êla kurdî bi xwdîkirina hespên resen û siwarbazên xwe navdar bû. Heya niha jî di destanên qehremaniyê yên Kurdan da pesna *Siwarê Hedban* (*siwarê hedbên*) hên jî tê bihîstin. Hoza *Rowadî* ya vê êlê *Dewleta Rowadî (El-Rewadiye)* li Azerbeycan û başûrê Qefqasê (230-618-ê goçî) damezrand û hoza *Şedadî* jî *Dewleta Şedadî* (340-468-ê goçî) li wê herêma kurdî ku niha di navbera Azerbeycan, Ermîniya û Gurcistanê da parvekirî ye, damezrand.

Wisa, em dibînin ku malbata *Eyûbî* vedigere ser êleka xwedî berma û serboriyeka dîrokî di avakirina dewletan da. Dîroknas *Ebo Şameh* di axaftinên xwe da li ser *Eyûbiyan* dibêje: "**Ew ji Kurdên Rewadî ne**"; û bi ser va temam dike: "**Ev êla ji rûmetdarên Kurdane**"[2] ;yanê ev êleka payebilinde. Ev jî tê wê maneyê ku daxwaza malbata *Eyûbî* ji avakirina dewletê ra, ne daxwazeka biyanî bû. Ji berê da ew xwedî bermayeka siyasî bûne û hên jî ev tişt di bîreweriya wan da zindî mabû. Bi taybetî jî ku *Dewleta Şedadî* kete destê *Selcoqiyan* berî damezrandina *Dewleta Eyûbî* (sala 570-ê goçî) bi kêmtirî sedsalekê û *Dewleta Rowadî* li Azerbeycanê hên hebû, dema ya *Eyûbî* pêkhat.

Gava em bidin pey şopa malmezinên malbata Eyûbî, em dibînin ku ew xwedî taybetmendiyên rêveberî û serboriyên gerînendeyî yên berz û navdar bûn; ji bilî rewişt û taybetmendiyên têkoşerî ku bi lehengî û qehremaniyê dihatin naskirin. Gava serekdarê peywan û nigehdarên Bexdadê *Behrûz* gazî dostê xwe *Şadî* (bapîrê malbata *Eyûbî*) kir û serdariya keleha Tekrîtê sparte wî, ev taybetmendiyên wî û yên herdu kurên wî *Eyûb* û *Şêrkoh* dizanîn û dema ku *Zengî* jî li Mûsilê pêşwaziya wan kir, piştî ku ji Tekrîtê hatin goçkirin û zeviyên mezin dan wan, wî jî ev taybetmendî dizanîn. Ji lewra jî, hewlda ku wan wek rêveber û şervan li dijî dijminên xwe ji *Selcoqiyan* û li dijî *Firengan* ku bi wî ra cîwar bûn, qezenc bike.

## Duwem - Hêmanên Herêmî:

*Eyûbî* derbarê rewşa rojavayê Asiyayê ne cahil û nezan bûn. Wan dizanî ku *Selcoqî* di vê axê da biyanî ne. Lê belê bi sedema lehengiya xwe û ketina wan bin rêveberiyeka tund û sext da *Dewleta Xeznewî* xistin bin sîbera xwe ku berê di nav leşkerê wê da wek çete kar dikirin. Di pey ra dikarîbûn xwe li ser xelîfeyê *Ebbasî El-Qayêm Bi Emrîllah* ferz bikin, *Dewleta Buweyhî* ji holê rakirin û ev welat ji Afganistanê heya bi Şamê xistin bin desthilata xwe. *Eyûbiyan* ew yeka jî dizanî ku *Zengî* ser bi sultanên *Selcoqiyan*e. Lê belê, ji ber ku ew bûn xwediyê hêzeka şervan û taybetmendiyên rêveberî û gerînendeyî yên berz û lehengî jî bi ser da li ba wan hebû, di destpêkê da mîrîtiyek avakirin, paşê mîrîtî kirin seltenet û ji aliyê xelîfeyê *Ebbasî El-Mustedî Bi Emrîllah* va hatin pênasîn û pejirandin.

Belê, wê hîngê rê û şêwaz wisa bû ku tu rêveber û leheng bî, xwedî hêzeka şervan bî, tu herêmekê têxî bin destê xwe û paşê fireh bikî. Hîngê te zûka dikarî, tu kelîja xwe li ser dijminên xwe û li ser xelîfeyê *Ebbasî* jî ku di warê fermî û şerî'eyî da desthilatî di dest xwe da hiştibû, ferz bikî. Diviyabû ku tu ji wî pênasîna

[2] Ebu Şameh, Ûyûn El-Rewdeteyn, 1/403.

desthilatdariya xwe bixwazî. Hîngê ji te ra mîtanek û alayek; û lexemê "sultan" dişand; ferman dida oldar û feqehan ku te di nava cemawerên gel da rûmetdar bikin. Helbet li hember wê, diviyabû tu kelîja wî ya ayînî û siyasî biparêzî, tu roja îniyê di xutbeyên mizgeftan da navê wî berî navê xwe bînî ser ziman û tu gencîneya wî bi pere û diravan dagirî, daku li cariye, kole, karmend, feqeh û leşkerê xwe xerc bike. Ev tişt, *Buweyhî*, *Xeznewî*, *Selcoqî* û *Zengiyan* jî dikir û helbet *Eyûbiyan* jî wisa kir.

| | |
|---|---|
|  (فرسان المعبد الفرنج) |   (موقع معركة حطين) |

Hên hêmanekî dinî herêmî heye ku *Selaheddîn* xiste xizmeta dewleta xwe; ew jî talankirina *Firengan* (*Xaçeperestan*) ji herêmên rojavayê Asiyayê û Misirê ra bû. *Firengan* sala 492-ê goçî (1099-ê z.) bajarê Qudsê dagîr kir. Bajarê Qudus bajarê sêheme ji bajarên îslamî yên pîroz piştî Mekkê û Medinê. Ji ber wê, êdî pêwîst bû, kesê ku bixwaze pênasîna fermî û şerî'eyî ji *Xelîfeyê Ebbasî* qezenc bike û piştgiriya feqehan wergire, gazî cîhadê ji bo rizgarkirina Qudsê bike. *Selcoqiyan* û *Zengiyan* jî wisa kir û her wisa *Selaheddîn* jî. War û rewşa wî ya geo-siyasî ew neçar kir ku bi *Firengan* ra têkeve kefteleft û dijberiyê. Bi rastî serkeftinên mezin jî pêkanîn, wek şerê *Hettîn* û vegerandina Qudsê. Û wisa bû qehremanekî navdar di bermaya îslamî û bîreweriya îslamî da.

## Rastî eve:

Kurtahiya mijarê ewe ku *Dewleta Eyûbî* ji aliyê rêveberî, gerînendeyî û biryardayînê da kurdî bû. Rêveberiya giştî di destê malbata *Eyûbî* da bû û piraniya rêveberên herêman ji *Eyûbiyan* bûn, leşker jî bi piranî ji êlên Kurdan pêkdihat, tevî Turkuman û Memalîkên ku *Selaheddîn* xistibûn nav leşkeriyê. Sultanên *Eyûbiyan* yên din jî wisa kirin. Ji bilî vê, di *Dewleta Eyûbî* da tiştekî dinî kurdewarî tinebû. *Dewleta Eyûbî* li derveyî erdnîgariya Kurdistanê hate avakirin. Bajarê Qahîre paytextê wê yê yekem bû û bajarê Şamê jî paytexê duwem bû. Raste ku *Selaheddîn* rojavayê Kurdistanê û hin beşên bakur û başûrê Kurdistan jî dane ser dewleta xwe.


Lê belê, ev tişt tenha ji bo wê yekê kir ku pişta padîşahiya xwe ji bakur û rojhilat va biparêze.

Ji lewra, projeya *Selaheddîn* ne kurdistanî û ne jî neteweyî bû. Ji ber ku dem ne dema tevgerên neteweyî bû. Û hebûna nawenda padîşahiya wî li Misir û Sûriyayê, rawestana wî li dijî *Firengan*, girêdana wî ser bi *Xîlafeta Ebbasî* û çanda wê demê ya Îslamî-Sunnî-Şafi'î, van hemû hêmanan li ser wî ferz kir ku ew xwediyê projeyeka Îslamî-Cîhadî-Erebî be. Armanca wê dewletê ya yekem rizgarkirina weltên Şam û Misirê ji *Firengan* bû û ne rizgarkirina Kurdistanê ji *Selcoqiyan* bû. Em di jînenîgariya *Selaheddîn* da ti tiştî nabînin ku hewas û meraqa wî li ser zimanê kurdî û çanda kurdî hebû. Em hejmareka ne biçûk ji mîrên *Eyûbiyan* dibînin ku helbestên nirxdar bi zimanê erebî nivîsandine, lê ne bi kurdî.

Rewişt û nîşanên kurdewariyê di *Dewleta Selaheddîn* da tenha di van çend tiştan da tê xuyakirin:

**1 -** Navên êl û hozên kurdî (*Hemîdî, Zurzarî, Qeymerî, Hekarî û Mihranî*) û navên kesayetiyên Kurd (*Bozan, Xeştirîn, Dirbas, Şêrkoh, Şahînşah, Mamîn û Mûsik*).

**2 -** Alaya *Selaheddîn* ya sultaniyê ku ji wêneyê şahînekî sor li ser bingeheka zer (zerd)[(3)]. Rengê sor rengê agire û rengê zer nîşana tav û rojê ye. Ev ji kevintirîn nîşanên ayînî kurdî ne.






**3 -** Pîrozkirina cejna *Newrozê (Nû Roj, Newroz, Neyroz)* ji aliyê *Dewleta Eyûbî* da dihate naskirin. Lê di heyama *Selaheddîn* da bi navê "*Newroza Sultanî*" dihate naskirin[(4)].

**4 -** Taybetmendî û rewiştên kurdîtiyê di kesayetiya *Selaheddîn* da hebûn, wek lehengî, payedarî, lêborînerî û bexşenderî. Ji ber wê jî wek "*Sultanê Mihirvan*" hate naskirin. Kesayetiya ewropî "*Albert Chandur*" wî wek qehremanê herî avêne û pak di Îslametiyê da bi navdike[(5)].

Ji bilî van tiştan, *Dewleta Selaheddîn* xizmeta *Îslama Sunnî* û *Dewleta Ebbasî* kiriye. Ji ber wê jî *Selaheddîn* xwe di nameyên xwe da ji *Xelîfeyê Ebbasî* ra li Bexdadê wek "xizmetkar" bi navdike[(6)]. Em jibîrnekin ku bergiriya *Selaheddîn* ji

[3] Mihemed Emîn Zekî, Dîroka Dewlet û Mîrîtiyên Kurdan di heyama Îslamî da, rûpel 193. Alî Mihemed Mihemed El-Selabî: Selaheddînê Eyûbî, rûpel 237, nîşe 3.
[4] Ibin El-Esîr, El-Kamil fî Tarîx, 20/10.
[5] Albert Chandur pirtûkek bi sernivîsa "Selaheddîn - Qehremanê herî pak di Îslametiyê da" weşandiye.
[6] Ebu Şameh, Ûyûn El-Rewdeteyn, 3/67, 86, 88.

ber Îslametiyê da û têkbirina talanên *Firengan*, bi ser Kurdan da dijminahiya *Ewropaya Xirîstiyan* sepand û barand. Ji encamên wê ewe ku hêzên mezin yên ewropayî bi dirêjahiya sedsalên 19-an û 20-an li dijî şoreşên Kurdan radiwestiyan û damezrandina "*Dewleta Kurdistan*" nedipejirandin.